RÊVEBERIYA XWESER
LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ
DESTEYA PERWERDE Û FÊRKIRINÊ

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ

## 6




2019/2020

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ 6

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**BEŞA YEKEM** ........................................................................ 7

**MALBATA SELME** ........................................................ 8

**EM DIHEJMÊRIN ........................................................ 10**

**DAWET**...................................................................... 12

**EV ÇI YE?** ................................................................ 15

**ROVÎ Û QIJIK ............................................................ 18**

**PAYÎZ** ........................................................................ 22

**BERX Û KARIK** .......................................................... 24

**BEŞA DUYEM** ............................................................. 27

**ŞIVAN** ........................................................................ 28

**NAMEYA ZELALÊ**.................................................... 33

**NAN** ............................................................................ 35

**LI BAZARÊ** ............................................................... 38

**DEMSAL**.................................................................... 42

**DÎK Û KÎSO** ............................................................... 45

**BIRAYÊ MIN NEXWEŞ E** ........................................ 49

**BEŞA SÊYEM ............................................................. 51**

**NANPÊJ ....................................................................... 52**

**NÎVÊ BIÇÛK**.............................................................. 54

**PISÎK Û MIŞK** ........................................................... 57

**KOLAN Û PAQIJÎ............................................................ 60**

**OMER** ... 63
**BIRATIYA QULING Û ROVÎ** ... 65
**PERPERÎK** ... 68
**BEŞA ÇAREM** ... 71
**KURKÊ ROVÎ** ... 72
**XATÛN** ... 75
**SÎSIKA HILÛKÊ** ... 77
**RÊYA PEYAYAN** ... 80
**SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ** ... 84
**SERSALA WE PÎROZ BE** ... 86
**KÛÇIK Û PARÇEGOŞT** ... 88

# BEŞA YEKEM



## MALBATA SELME



Malbat ji dê, bav û zarokan pêk tê. Lê malbatên biçûk, an jî mezin hene. Malbata Selme ji pênc kesan pêk tê; dê, bav û sê zarok. Gava ku ew serê sibehan ji xew radibin, her yek karekî dike. Selme û Ehmed taştê amade dikin. Bav çayê dikelîne. Dê jî kincên Cemîleya biçûk lê dike.

Hevkarî di nava malbatê de, jiyanê xweştir dike. Piştî taştê dê û bav diçin kar, Selme û Ehmed diçin dibistanê û Cemîle jî diçe pêş dibistanê.

**Pirs:**

1) Malbat ji kê pêk tê?
2) Malbata Selme ji çend kesan pêk tê?
3) Gava ku ew serê sibehan ji xew radibin, dê û bav çi dikin?
4) Di malbata we de çend kes hene? Navê wan binivîse.

**Valahiyên li jêr, bi van peyvan dagire:**

**biçûk – zarokan – sibehan – kesan – taştê**

Malbat; ji dê, bav û .............. pêk tê. Lê malbatên biçûk, an jî mezin hene. Malbata Selme ji pênc ............. pêk tê; dê, bav û sê zarok. Gava ku ew serê .............  ji xew radibin, her yek karekî dike. Selme û Ehmed .............. amade dikin. Bav, çayê dikelîne. Dê jî, kincên Cemîleya ........... lê dike.

# EM DIHEJMÊRIN

Em dihejmêrin yek, du, sê

Niha dema piyasê

Werin, da em bilîzin

Mêw, mêw, mêw




Em dihejmêrin çar, pênc, şeş

Civîna me bûye geş

Werin, da em bistrên

La le, la le, la le

Em dihejmêrin heft, heşt, neh

Niha em gihiştin deh

Werin da em bikenin

Ha he, ha he, ha he

**Pirs:**

1) Ev helbest, li ser çi hatiye gotin?
2) Hejmarên ku di helbestê de hatine, bi rêzê binivîse.

**Hejmarên di hevokên li jêr de, bi nivîskî binivîse:**

a) Ez (2).............. gulan dibînim.
b) Te (4)................ pênûs kirîn?
c) Em (12)............... navan dinivîsin.
d) Wê (7)................ xwendekar perwerde dikirin.
e) Em (13)................. kes in.
f) Wan (10)................ çûk dîtin.

**Hejmarên li jêr, bi nivîskî binivîse:**

| | | |
|---|---|---|
| 11...................... | 21...................... | 40...................... |
| 12...................... | 22...................... | 50...................... |
| 13...................... | 23...................... | 60...................... |
| 14...................... | 24...................... | 70...................... |
| 15...................... | 25...................... | 80...................... |
| 16...................... | 26...................... | 90...................... |
| 17...................... | 27...................... | 100.................. |
| 18...................... | 28...................... | 200.................. |
| 19...................... | 29...................... | 300................... |
| 20...................... | 30...................... | 1000.................. |

# DAWET



Em çûn daweta Sîpan û Rewşenê. Gelek kes hatibûn dawetê. Bi dengê dahol û zirneyê, govend digeriya. Jin û mêr bi hev re ketibûn govendê. Zarokan jî dîlan dikir. Ez, Necma û Elî me bi hev re lîst. Me li dawetê, xwarineke xweş  xwar. Xwarina dawetê goşt û birinc bû. Me di dawiyê de Sîpan û Rewşenê pîroz kirin. Dema em vegeriyan malê, me ji dê û bavê xwe re pesnê dawetê da. Em bi dawetê gelekî dilşat bûn. Ji ber ku em di dawetê de gelekî westiyabûn, em zû razan.



**Pirs:**

1) Dawet  a kê bû?
2) Li dawetê li çi dixistin?
3) Wan çi li dawetê xwar?

## Cînavkên Kesane

Cînavkên kesane, ji du beşan pêk tê:

**Xwerû**: Ez – Tu – Ew – Em – Hûn – Ew

**Tewandî**: Min – Te – Wî/ê – Me – We – Wan

**Mînak:**

Ez diçim dibistanê.

Min ji xwe re pirtûkek kirî.

Ez û tu heval in.

Wî  silav li min kir.

Wê ji te re çi anî?

Min ew dît.

Hûn bi ku ve diçin?

Em tên mala we.

**Li şûna navên ku bine wan xêzkirîne, cînavkên guncaw binivîse:**

**Wê – Ew – Em – Wî – Ew**

Hisên û Rîma ji mal derketin.

Fatime perwerde dide.

Îsa, ji me re stran gotin.


Şadiye di pêşbirkê de bi ser ket.

Ez û Salih çûn nêçîrê.

**Li cihên vala, cînavkên guncaw binivîse:**

1) ....... ji bazarê têm.
2) ....... ji welatê xwe pir hez dikin.
3) ....... diçe gund.
4) ....... rojnameyan dixwinin.
5) ....... çi dixwînî?
6) ....... diçin gund.
7) ....... her roj diranên xwe firçe dikim.
8) ....... li kîjan bajarî rûdinî?
9) ....... li kîjan bajarî rûdine?
10) ...... duh çûn nav zeviyan.
11) ....... ji Qamişlo me.
12) ....... xweşik in.

# EV ÇI YE?



Navê fêkiyekê ye.



Ji pirteqalê mezintir e.

Lê yên biçûktir jî hene.

Kulîlkên wê sor in.

Rengê qalikê wê ji kesk heta sor tê guhertin.

Di hundirê wê de bi sedan lib hene.



Hin tirş û hin jî şêrîn in.

Li gelek deverên Rojava hene.

Bilindahiya darê wan tê guhertin.

Dikarin ji metreyekê heta çend metreyan bilind bibin.

Pelên darê wan biçûk û rengê wan keskekî tarî ye.

Ew payizê digihêjin.

Ev fêkî çi ye?

**Pirs:**

1) Kulîlkên vê fêkiyê çawa ne?
2) Rengê qalikê vê fêkiyê çawa ye?
3) Di hundirê qalikan de çi hene?

**Valahiyên li jêr, bi van peyvên guncaw dagire:**

**tûj – tirş – şîrîn – nerm – hişk – şor – sar – germ**



Xwê ................ e.



Şekir ................. e.



Leymûn ........... e.



Îsot ................. e.



Kevir ............... e.



Pembû ............. e.



Havîn ............. e.



Zivistan .............. e.

# ROVÎ Û QIJIK



Hebû tunebû, rojekê ji rojan Qijikek hebû, li ser darekê rûniştibû, ji xwe re parçeyek penêr peyda kiribû û dikir bixwe. Çima Roviyek di wir re derbas nebû! Çavên wî jî bi Qijikê ket, lê tişta ku hişê Rovî bir, ew parçeyê penêr yê di devê Qijikê de bû. Rovî ji xwe re got: Divê ez dek û dolabekê bikim da ku wî parçeyî ji Qijikê bistînim. Xwe nêzîkî Qijikê kir û got:

- Roj baş, tu çawayî xwişka Qijik? Ez ji bo dîtina te pir kêfxweş im!

Qijik, bi serê xwe silavê dide Rovî.



Rovî:

Ew bejn û bala li ser te, weke şahê li ser text e. Perên te yên delal, weke ava zêr, zelal e. Xwişka Qijik! Dengê te pir xweş e. Ka bi wî dengê xwe yê xweş, ji min re stranekê bêje.

Qijik, bi van gotinan pir kêfxweş dibe û dike ji kêfan bifire! Ji bo ku stranê bêje, devê xwe vedike, penêr dikeve ber lingên Rovî.

Rovî penêr ji erdê radike û ji Qijikê re wiha dibêje:

**"Ger ên weke te bêhiş hebin; dê jîrên weke min, her hebin."**

**Pirs**:

1) Rovî, li ku derê Qijik dît?
2) Çavên Rovî, li çi bûn?
3) Rovî, çawa Qijik xapand?
4) Rovî, di dawiyê de çi got?

Her hejmarek, li cihê tîpekê hatiye nivîsandin. Hejmaran bi tîpan biguhere û di lênûsa xwe de binivîse. Weke mînaka yekem:

| | | |
|---|---|---|
| **1**<br>**K** | **2**<br>**X** | **3**<br>**E** |
| **4**<br>**W** | 5<br>**B** | 6<br>**R** |
| **7**<br>**Q** | 8<br>**Î** | 9<br>**D** |

a) 9 8 1 → D Î K

b) 5 3 6 2 → ☐ ☐ ☐ ☐

c) 1 3 6 → ☐ ☐ ☐

d) 5 3 7 → ☐ ☐ ☐

e) 1 3 4 → ☐ ☐ ☐

f) 6 3 7 → ☐ ☐ ☐

# Nêr û Mê

Di zimanê kurdî de nêr û mê gelekî giring in. Ji ber ku nêr û mê ji hev hatine veqetandin.

Nêr; bi veqetandeka (**ê**) û mê jî; bi veqetandeka (**a**) tên nîşankirin. Lê dema ku pirjimar be, ji bo her duyan jî veqetandeka (**ên**) tê bikaranîn.

**Mînak:**

Keç**a** min

Kur**ê** min

Heval**ên** min

Li cihên vala (-**a**, -**ê**, -**ên**) binivîse:

1) Ehmed, heval...... min e.

2) Xezne, heval..... min e.

3) Ezîz û Mihemed, heval...... min in.

4) Eyşê, xaltîk...... min e.

5) Ev mal...... me ye.

6) Pênûs...... te xweşik e.

7) Zarok...... cîranê me pir in.

# PAYÎZ



Dema payîz tê, germahiya rojê her ku diçe kêm dibe. Pelên daran zer dibin û diweşin. Koçer ber bi deştan ve vedigerin. Gundî dar, tiştên xwe û arduyên xwe têxin mal de. Ew giya û êzingên xwe kom dikin. Dibîstan vedibin. Zarok diçin dibistanan. Cotkar zeviyên xwe diçînin, her kes amadekariya zivistanê dike. Dema peşkên baranê tên, bêhna axê xweş dibe. Gundî jî serbanên xwe didûn û ba jî hêdî hêdî xurt dibe. Gel êdî ji bo amadekariya zivistanê, cilên xwe yên stûr amade dikin. Ji ber ku zivistan gelekî sar e.


**Pirs:**

1) Dema payîz tê, germahî çawa dibe?
2) Çi ji pelên daran tê?
3) Cotkar, di payîzê de çi dikin?

## Peyvên dijhev, bi xêzekê bigihîne hev:

| | | |
|---|---|---|
| **Reş** | | **Erzan** |
| **Dûr** | | **Germ** |
| **Bilind** | | **Spî** |
| **Jêr** | | **Dirêj** |
| **Buha** | | **Dijmin** |
| **Sar** | | **Nêzîk** |
| **Kurt** | | **Biçûk** |
| **Dost** | | **Jor** |
| **Mezin** | | **Hişk** |
| **Nerm** | | **Nizim** |

# BERX Û KARIK



Di biharê de, li dora gundê me dengê berx û karikan xweş tê guhên me. Du berxên min hene, yek gewr, a din jî ser reş e. Pismamê min Xalid, bi qasî min ji berxan hez nake, ew bêtir ji karikan hez dike. Bavê wî, jê re ji gundê xalê wî karikek anî. Min ew karik dît, bi rastî jî karikeke gelek spehî ye. Dilîze, dibeze û dema ku apê min banê dike, ew tê rex wî û bi çavên xwe yên biçûk lê dinêre. Carinan ez bi karika wî û carinan jî ew bi berxên min re dilîze. Di navbera min û pismamê min de cudahî nîne, em her du birayên hev in û ji hev hez dikin. Dema ku zarokên gund tên mala me, ew jî bi berx û karika me re dilîzin.

**Pirs:**

1) Li dora gundê me dengê çi tê?
2) Çend berxên pismamê Xalid hene?
3) Karika Xalid çawa ye?

**Valahiyên li jêr, bi van peyvan dagire:**

**karikek – biçûk – dibeze – nake**

Pismamê min Xalid, bi qasî min ji berxan hez........., ew bêtir ji karikan hez dike. Bavê wî, jê re ji gundê xalê wî ................ anî. Min ew karik dît, bi rastî karikeke gelek spehî ye, dilîze,............... û gava apê min banê dike, ew tê rex wî û bi çavên xwe yên............. lê dinêre. Carinan ez bi karika wî û carinan ew bi berxên min re dilîze.

**Valahiyên di xaçepirsê de dagire:**


1) Navê şînîyekê
2) Pirça serê mirovan
3) Lawireke kedî
4) Mirov dixwîne
5) Mirov pê dixwe
6) Fêkiyek
7) Mirov xwe pê ji baranê diparêze
8) Ji ard çêdibe
9) Lawirek siwarbûnê





| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | P | | | | |
| 2 | | | | O | | | | |
| 3 | | | | S | | | | |
| 4 | | | | T | | | | |
| 5 | | | | E | | | | |
| 6 | | | | X | | | | |
| 7 | | | | A | | | | |
| 8 | | | | N | | | | |
| 9 | | | | E | | | | |















# BEŞA DUYEM



# ŞIVAN



Şivanek hebû, bilûrvanekî hêja û jêhatî bû. Ew hê nozdeh salî bû û wî pezê xwe baş diçêrand. Kesekî wî li vî gundî tune bû. Ew ji aliyê Tilkoçer ve hatibû. Navê wî jî Mihemed bû.

Li gund her kesî jê hez dikir. Şivan di meha Adarê de dest bi şivantiyê kiribû. Wî pezê xwe bi şevê jî diçêrand û bi roj dianî nava gund. Dema ku wî pez dianî ser avê, bilûra xwe derdixist û li bilûrê dixist, pez jî yeko yeko dida pey wî û ber bi avê ve dihatin. Dengê bilûra wî wisa xweş bû ku keç û xortên gund kar û barên xwe disekinandin, tenê li bilûra şivan guhdar dikirin.

**Pirs:**

1) Şivanê gund çend salî bû?
2) Şivan ji kîjan alî ve hatibû?
3) Dengê bilûra wî çawa bû?

**Hevokên li jêr bixwîne:**

Kesekî wî **li** gund tune bû.

Ew **ji** aliyê Tilkoçer **ve** hatibû.

**Li** gund her kesî jê hez dikir.

Şivan **di** meha Adarê **de** dest bi şivantiyê kiribû.

Wî pezê xwe **bi** şevê jî diçêrand.

## Daçek

Di zimanê kurdî de çar daçekên bingehîn hene:

**Li**: Ez li malê me.

**Bi**: Em bi pênûsê dinivîsin.

Fewaz bi birayê xwe re dixwîne.

Wî av bi min de kir.

Ew bi aliyê mala we ve diçû.

**Di**: Şagirt di refê de ne.

Hevaleke min di kolanê re derbas bû.

**Ji**: Ew ji gundê me ye.

Dayika min, ji min re çîrokan dibêje.

Bavê min ji dûr ve tê.

**Valahiyên li jêr, bi van daçekan dagire:**

(**li**, **bi**, **ji**, **di**... **de**)

a) Ew ...... Hesekê ye.
b) Xalid ...... refê ...... ye.
c) Semîr ...... Zirgan dijî.
d) Ez ....... hevala xwe şa dibim.

**Hevokên li jêr bixwîne:**



Çûk **li ser** darê ye.



Zarok û pisîk **li rex** hev in.



Ew **li bin** darê ye.

Gok **li jor** e.



Lîstikvan **li jêr** e.



Masî **di nava** avê **de** dijîn.

Mêze, **di navbera** kursiyan **de** ye



## Daçekên Hevedudanî

Di zimanê kurdî de daçekên hevedudanî hene. Hin ji wan, ev in:

li ser, li rex, li bin, li jor, li jêr

ji jor ve, di nav ..... de, di navbera .... de,

bi ser, bi jor ve, di bin re.

# NAMEYA ZELALÊ

Hevala hêja!



Min gelekî bêriya te kiriye. Min pir dixwest ku ez ji te re nameyekê bişînim. Weke ku tu jî dizanî, heta niha min nikarîbû baş binivîsim û bixwînim. Par dema ku ez ji bajêr vegeriyam û hatim malê, min dest bi dibistanê kir. Dibistana min gelek xweş bû. Ez fêrî xwendin û nivîsandinê bûm. Birayekî min çêbû. Me navê wî kir Ezîz. Carinan bi şev pir digirî. Bavê min, ji min re duçerxeyeke nû kirî. Ez ê havînî pê bigerim û dixwazim tu piştî girtina dibistana xwe werî cem me. Gava tu bê, em ê bi hev re bilîzin û bigerin. Li vê derê gelek cihên lîstikên xweş yên zarokan hene.

Ez gelek silavên germ ji we re rêdikim.

Zelal

**Pirs:**

1) Zelalê di nameya xwe de li ser çi dinivîse?
2) Tu jî dikarî nameyekê ji hevala/ê xwe re binivîsî.

**Heye/hene:**

Karê min heye.

Çar pênûsên min hene.

**Valahiyên li jêr, bi heye/hene dagire:**

Pênc berxikên min ............


Hevalekî te jî ............

Sêvên min ............

Du xwişkên wî .............

# NAN





Diya min, li malê nan dipêje. Em li malê piranî nanê genimî dixwin. Lê nan, ne tenê ji genim tê çêkirin. Nan ji ceh û garis jî çêdibe.

Hûn dizanin, nan çawa tê çêkirin?



Destpêkê genim tê çandin, piştre genim şîn dibe û bilind dibe. Dema ku ew simbil dide û hişk dibe, tê çinîn. Em genim li aş dihêrin û dikin ard. Ji ard, hevîr tê çêkirin. Em hevîr di tenûr û firinan de yan jî li ser sêlan dipêjin û dikin nan. Rojava, ji aliyê çandiniyê ve pir dewlemend e. Tiştên ku li Rojava piranî tên çandin; genim, ceh, nîsk û nok in.

**Pirs:**

1) Nanê ku em dixwin, ji çi çêdibe?
2) Ji bilî genim, nan ji çi tê çêkirin?
3) Rojava, bi çi dewlemend e?
4) Li Rojava çi tê çandin?

**Hevokên li jêr bixwîne:**

**Diya** min, li malê nan çêdike.

Em li malê piranî **nanê** genimî dixwin.

**Tiştên** ku li Rojava tên çandin: Genim, ceh û garis in.

# Veqetandek

**Di zimanê kurdî de veqetandek:**

**....a:** Veqetandeka ji bo yekjimara zayenda mê ye.

**Mînak**: Pirtûk**a** min hêja ye.

Gul**a** sor xweşik e.

**....ê:** Veqetandeka ji bo yekjimara zayenda nêr e.

**Mînak**: Ez ji xal**ê** xwe hez dikim.

Xaniy**ê** Yasir mezin e.

**....ên:** Veqetandeka ji bo pirjimara her du zayendan e.

**Mînak**: Dayika min cil**ên** me dişo.

Dar**ên** di hewşa dibistana me de bilind in.

**Valahiyan li jêr, bi veqetandekên (a, ê, ên) dagire:**

a) Dest...... min paqij in.
b) Bira...... delalê nexweş ketiye.
c) Du xwişk....... Dîmayê hene.
d) Nav....... mamosteyê me Hesen e.
e) Cîran....... me malbateke kurd e.

# LI BAZARÊ



Apê min diçe bazarê. Ez jî dixwazim bi wî re herim bazarê. Ez kincên xweşik li xwe dikim û sola nû li piyên xwe dikim. Apê min hespê xwe tîne û bi cil dike, lê siwar dibe û ez jî li pişt wî siwar dibim. Apê min di rê de stranan dibêje û hespê xwe dajo. Bazar li aliyê rojhilatê bajêr e. Piştî demjimêrekê, em gihiştin bazarê. Bazar gelekî mezin e. Ne serî û ne jî binî ye. Li bazarê bi hezaran mirov tiştan dikirin û difiroşin.

Gelek ji wan bi zimanekî din dipeyivin. Apê min jî bi zimanê wan dipeyivî. Ez ji apê xwe dipirsim:

- Apo, ev çi ziman e?



Apê min dikene û ji min re dibêje:

- Zimanê li bazaran, weke fêkiyan rengereng in.

Em ji bo malê, pênc kîlo şekir, kîloyek çayê, nîsk, sêv, pîvaz, kartol, tirî û gêzeran dikirin. Apê min perê firoşkar dide wî û dipirse:

- Tu dikarî alîkariya min bikî?

Firoşkar dibêje:

- Belê, ser çavên min!

Em tiştên xwe li hespê bar dikin û li hespê xwe siwar dibin, bi rê dikevin. Di rê de apê min dîsa stranan dibêje û ez jî tirî dixwim. Piştî nîvro em digihêjin malê.

**Pirs:**

1) Apê wî di rê de çi dibêje?
2) Bazar li kîjan aliyê bajêr e?
3) Navê çar tiştên ku wan kirîne, bêje.
4) Wî li ser hespê çi dixwar?

**Hevokên li jêr bixwîne:**

Apê min **diçe** bazarê.

Ez kincên xweşik li xwe **dikim**.

Apê min hespê xwe bi cil **dike**.

Ez jî li pişt wî siwar **dibim**.

Apê min di rê de stranan **dibêje**.

Li bazarê mirov tiştan **difiroşin**.

## Di dema niha de dîtina rayeka lêkeran:

| Cînavk | Lêker (Dema Niha) | Pêveka Dema Niha | Rayeka Dema Niha | Qertafa Kesane |
|---|---|---|---|---|
| **Ew** | dixwe. | di | **xw** | e |
| **Ez** | dilîzim. | di | **lîz** | im |
| **Em** | dibezin. | di | **bez** | in |
| **Tu** | dikenî. | di | **ken** | î |

| Cînavk | Pêveka Dema Niha | Rayeke Dema Niha | Pêvekên Kesane | Hevok |
|---|---|---|---|---|
| Ez | di | ç | **im** | **Ez diçim.** |
| Tu | | | **î** | **Tu diçî.** |
| Ew | | | **e** | **Ew diçe.** |
| Em | | | **in** | **Em diçin.** |
| Hûn | | | **in** | **Hûn diçin.** |
| Ew | | | **in** | **Ew diçin.** |

## Forma dema niha (lêkera çûn):

**Lêkerên di nava hevokên li jêr de, li gorî dema niha binivîse:**

1) Îro baran (barîn) ............................
2) Azad (çûn) .......................... dibistanê.
3) Besam karê xwe (kirin) .......................
4) Ezîz (hatin) ....................... malê.
5) Ez wî (dîtin) ........................
6) Ew sêvê (xwarin) .........................
7) Rodî bi gokê (lîstin) ...........................
8) Ew daran (çinîn) .......................
9) Em bi hev re (kenîn) .........................
10) Ew nameyê (nivîsandin) .......................

## DEMSAL



Payîz bi xêr û bêr e
Kewara zîv û zêr e
Hezar spas ji wê re
Nehiştin derd û mital



Sar û seqem zivistan
Berf nizane rawestan
Tev dilîzin bê westan
Spî bû kaş û kendal



Bi xêr hatî biharê
Xemilîn guliyên darê
Sibe, nîvro, êvarê
Dixwînin teyr û sewal



Havîn e dema kar e
Ceh û genim li dar e
Derdor toz û xubar e
Tu kes nîne li mal

**Azadiya Welat**

# Ev kîjan demsal e?

**Payîz – Zivistan – Bihar – Havîn**

Hewa sar e.
Em cilên stûr li xwe dikin.
Berf dibare. Em li ser berfê dilîzin.



.......................



Ba tê. Hewa êdî sar e.
Pelên daran zer dibin û diweşin.
Legleg diçin welatên germ.

........................

Hewa germ e.
Em kincên tenik li xwe dikin.
Em diçin ber avê û avjeniyê dikin.






......................

Derdor şîn dibin.
Kulîlk rengîn dibin.
Legleg vedigerin hêlînên xwe.


..........................

**Mehên salê, li gorî demsalan parve bike:**

Berfanbar – Reşemeh – Avdar – Cotan – Gulan – Pûşber – Tîrmeh – Gelawêj – Rezber – Cotmeh – Mijdar – Rêbendan



# DÎK Û KÎSO



Hebû tunebû, dîkek û kîsoyek hebûn.

Salekê her duyan biryar dan ku bibin hevparên hev ên cotkariyê. Amadekariya xwe kirin ku wê salê cotkariya xwe bikin. Tovê xwe peyda kirin û man li hêviya dema cotkirinê. Lê dîko her roj diçû hinek ji tovê wê salê dixwar. Heta kîso pê hesiya, wî nîvê tov xwaribû. Kîso hêrs bû, rabû darek li qorika dîko da. Ba ji ber dîko çû. Dîko jî nikilek li nava çavê kîso da û çavê wî teqand.

Kirin û nekirin, li hev nehatin. Biryar dan ku herin cem kund û pirsgirêka xwe çareser bikin. Bi hev re dan ser rê û çûn ber dadmendiya kund.



Kîso berê xwe da kund û got: Kund û Kund!

Kund: Ew navê min e.

Kîso: Li ser darê.

Kund: Ew paytexta min e.

Kîso: Em hatine cem te dadmendiyê.

Kund: Ew karê min û bavê min e.

Kîso: Ez û dîko bûne hevparên cot.

Kund: We baş kir.



Kîso: Dîko nîvê tov xwar.

Kund: Wî bênefsî kir.

Kîso: Min darek li qorika wî da.

Kund: Te bêmafî kir.

Kîso: Ba ji ber wî çû.

Kund: Wî bêhnfirehî kir.

Kîso: Wî nikilek li çavê min da, çavê min teqand.

Kund: Wî jî bêhemdî kir.

Kund rabû ser xwe û got: Bi eniya xwe ya pan bikim, min ya xwe got; dîk û kîso nabin hevparên cot.

**Pirs:**

1) Kî bi hev re bûn hevparên cot?
2) Dîko her roj çi dikir?
3) Kîso çi ji dîk kir?
4) Dîk û kîso çûne cem kê?

## Cihên vala, bi peyvên li jêr dagire:

**cotê – hesiya – cotkirinê – çavê – darek - hevparên**

Salekê her duyan biryar dan ku bibin..................... hev ên cotkariyê. Amadekariya xwe kirin ku wê salê ............... xwe bikin. Tovê xwe peyda kirin û man li hêviya dema .................... Lê dîko her roj diçû hinek ji tovê wê salê dixwar. Heta kîso pê ................, wî nîvê tov xwar. Kîso hêrs bû, rabû .................. li qorika dîko da. Ba ji ber dîko çû. Dîko jî nikilek li nava .................. kîso da û çavê wî teqand.

## Payeyên Rengdêran

Rengdêr, bi pêvekên; ......**tir**, ......**tirîn** tên payekirin.

**Mînak**:

Baş – baş**tir** – baş**tirîn**

Mezin – mezin**tir** – mezin**tirîn**

Bilind – bilind**tir** – bilin**tirîn**

**Payeyên van rengdêran binivîse:**

Dirêj - ......................... - .........................

Xweş - ......................... - .........................

Jîr - ......................... - .........................

Hişk - ......................... - .........................

Qelew - ......................... - .........................

# BIRAYÊ MIN NEXWEŞ E

Birayê min Hesen nexweş e. Ew di nava nivînan de ye. Serê wî gelekî têşe û ew dikuxe jî. Çavên wî sor bûne û dişewitin. Ez destê wî digirim, lê destên wî pir germ in. Mirovek tê mala me. Bavê min dibêje; ew bijîşk e. Ew mirovekî mezin e û çenteyekî wî heye, pêdiviyên wî tê de ne. Ew destê xwe dide ser eniya Hesen û dibêje: "Serê wî gelekî germ e." Piştre ew dermanekî spî dide birayê min û ji bavê min re dibêje: "Ta li ser wî heye. Pêwîst e ew vî dermanî bixwe da ku baş bibe." Lê Hesen dibêje: "ez vî dermanî qet naxwim."



Meta min hat û Hesen himbêz kir û jê re got: "Hesenê delal, pêwîst e ku yê nexweş dermanê xwe bixwe û şîretên bijîşk baş pêk bîne da ku ji nexweşiyên xwe xilas bibe." Hesen jî rabû dermanê xwe xwar û bi guhdariya çîroka meta xwe re di xew ve çû.

**Pirs:**

1) Kî nexweş e?
2) Mirovê ku tê mala Hesen, kî ye?
3) Bijîşk çi kir?
4) Pêwîst e ku yê nexweş çi bike?

**Li navê tiştên li jêr yên di xiştekê de bigere û cihên ku ew tê de ne, reng bike!**















| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | D | F | H | Î | S | M | K | L | B |
| Ç | A | V | T | R | W | A | G | İ | R |
| P | S | O | B | K | Û | S | Î | C | K |
| A | S | D | E | Ş | S | Î | D | B | Î |
| S | Ê | V | R | X | N | M | V | G | V |
| X | C | A | O | R | D | E | K | W | R |
| G | K | G | Ş | Q | C | D | J | Z | O |
| U | N | O | L | Z | V | Y | H | P | Ş |
| L | D | K | H | F | Y | M | İ | Ş | K |



# BEŞA SÊYEM

# NANPÊJ



Apê min jî nanpêj e
Karê wî pir dirêj e

Bi şev radibe ser xwe
Dike kar û barên xwe

Ard û avê tev dide
Hevîr ji wan çêdike

Paşê tev dike girêk
Tenik dike weke mirêk

Hevîr tavê nav agir
Ta sor dibe ser kevir

Paşê derdixe bi dar
Li me ew tev dike par

Ew nanê germ û taze
Qet naçe ji bîra me

Apê min jî nanpêj e
Bala wî pir dirêj e

**Pirs:**

1) Karê apê wî çi ye?
2) Hevîr ji çi çêdike?
3) Paşê hevîr tavêje nav çi?
4) Çi qet ji bîra wî naçe?

# Neyîniya Dema Niha:

**Mînak: Lêkera çûn**

| Cînavk | Pêveka Neyîniya Dema Niha | Rayeka Dema Niha | Pêvekên Kesane | Hevokên Neyînî |
|---|---|---|---|---|
| Ez | na | ç | im | **Ez naçim.** |
| Tu | | | î | **Tu naçî.** |
| Ew | | | e | **Ew naçe.** |
| Em | | | in | **Em naçin.** |
| Hûn | | | in | **Hûn naçin.** |
| Ew | | | in | **Ew naçin.** |

**Têbînî:**

Neyîniya dema niha, bi pêvekên (na, ni) çêdibe.

# NÎVÊ BIÇÛK



Selwa ji xwe re şekirek kirîbû. Wê, şekirê xwe veşart ku piştre bixwe. Birayê wê Samir, hîn sê salî bû. Lê weke mişkekî biçûk, li her devera malê li tiştan digeriya. Lewma ji ber wî veşartina tiştan pir zehmet bû. Samir vê carê jî cihê şekirê Selwa dît. Şekir ji cihê wê derxist û ber bi bavê xwe ve bazda û got:

-Bavo! Bavo! Min ji xwe re şekirek dît.

Bi dengê wî re Selwa jî ji odeya xwe derket û got:

-Na, na! Ew yê min e.

Samir:

-Na, yê min e. Min ji xwe re di dolabê de dît.

Bav:

-Belê, ew yê Selwa ye. Lê xwişka te dikare piçekî bide te.

Selwa:

-Baş e, bila nîvî yê min û nîvî jî yê wî be!

Samir:

-Baş e, lê bila nîvê biçûk yê Selwa be!

**Pirs:**

1) Selwa çi ji xwe re kirîbû?
2) Çima Samir weke mişkekî bû?
3) Samir ji bavê xwe re çi got?
4) Selwa û Samir şekir çawa parve kirin?

**Valahiyan, bi pevyên li jêr dagire:**

**mişkekî**, **derxist**, **şekirek**, **zehmet**, **sê salî**

Selwa ji xwe re..................... kirîbû. Wê, şekirê xwe veşart ku piştre bixwe. Birayê wê Samir, hîn ...................... bû. Lê weke ................... biçûk, li her devera malê li tiştan digeriya. Lewma ji ber wî veşartina tiştan pir ........................ bû. Samir vê carê jî cihê şekirê Selwa dît. Şekir ji cihê wî .................

# Peyvên Hevedudanî:

**Mînak**:

Por + zer → Porzer

Dil + geş → Dilgeş

Rû + ken → Rûken

**Ji peyvên li jêr, peyvên hevedudanî çêke:**

| | | |
|---|---|---|
| Çav | | Masî |
| Pez | | Sal |
| Ser | | Zirav |
| Bejin | | Hilat |
| Roj | | Nas |
| Şorbe | | Şîr |
| Rê | | Reş |
| Mar | | Kovî |

| |
|---|
| Çav................ |
| Pez................ |
| Ser.................. |
| Bejin................ |
| Roj.................. |
| Şorbe.............. |
| Rê.................... |
| Mar.................. |

# PISÎK Û MIŞK



Rojekê ji rojan pisîkek hebû, diçû û dihat tiştek ber nediket, lê ew jî hizirî û got:

Gereke ez dest bi hin dek û dolaban bikim, da ku ez zikê xwe têr bikim. Ew jî ji xanî derket û di kulekê re çavdêrî kir. Dît ku hêdî hêdî mişk derketin û bi hev re lîstin û banî hev kirin: Werin werin; “Pisîk ne li mal e, mişk Abdulrehman e”

Pisîkê xwe berda nava xanî,  lê bû wirt wirta mişkan û ketin qulan. Pisîka reben çû û hat, lê tiştek bi dest neket. Li ber kunê pal da, çavên wê ma li vê kunê  û li wê kunê. Ew hizirî, wê çawa mişkekî bigire, rabû banî mişk kir.

-Hey mişkê bê zirav, were em bazarekê bikin

- Mişk bersiv da û got: Ew çi ye?

Pisîkê got: Hema were, ji vê kunê derkeve û biçe kuna din, ez ê pênc zêran bidim te.

Mişk got: Weleh ev baş e, lê ez ê nerîna bavê xwe bigirim.

Mişk nerîna bavê xwe girt û vegeriya.

Pisîkê  jê pirsî; ha te çi got?

Mişk bersiv da û got: Ez bi eniya bavê xwe kim, ev rêya nêzîk û buhayê wê giran, ne sazkar e. Dibêjin: “Ne li nav tirban raze û ne xewnên giran bibîne.” Te nedît!

Pisîk, pîs pîs ji ber kunê çû.

## Pirs:

1) Dema mişk li hev kom bûn, çi gotin?
2) Pisîkê çi ji mişk xwest?
3) Mişk çi li pisîkê vegerand?
4) Pisîk çawa ji ber kunê çû?

## Valahiyan, bi peyvên li jêr dagire:

**dolaban**, **çavdêrî**, **pisîkek**, **Abdulrehman**, **derket**

Rojekê ji rojan.................. hebû, diçû û dihat tiştek ber nediket. Lê ew jî hizirî û got:

Gereke ez dest bi hin dek û ..................... bikim da ku ez zikê xwe têr bikim. Ew jî ji xanî ................ û di kulekê re ................ kir. Dît ku hêdî hêdî mişk derketin û bi hev re lîstin û banî hev kirin, werin werin; “pisîk ne li mal e, mişk .................. e".

### Cihên vala, bi lêkerên li jêr dagire:

**kirîn – xwar – hatin – diçirise – kenîn**

- Min sêvek .............
- Her du keçik ............
- Mihemed çar pirtûk ............
- Stêrk li asîman ............
- Dê û bavê min ............

# KOLAN Û PAQIJÎ



Kolanê, ji dara sêvê re digot:

Heger te rewşa min, derd û kulê min zanîbûya, hingî te yê zanîba ku çima ez ewqasî bi hêrs im. Tu li wî zarokî binêre! Şekirên xwe xwarin û kaxezên şekiran jî avêtin ser min. Ma çavên wî nabînin ku selika gemarê li kêleka wî ye.

Dara sêvê, piştî gotinên kolanê; kesereke dirêj kişand û got:

Ez baş têdigihîjim û maf didim te. Ma qey ez bê derd û kul im? Wî zarokê ku kaxez avêt ser rûyê te, gava din çi anî serê min! Wî sêvên ku gulî û şaxên min xemilandine, hîn kerik in û sor nebûne, jêkirin. Piştî sêv gez kir, fêm kir ku sêv hîn negihaye. Wî ew gulî û sêvên ku jêkiribûn, avêtin erdê.



Kolan: Ma qey derd û kulên min zarok bi tenê ne? Na! Binêre li wî zilamê ha! Cixara xwe kişand û binîka wê avêt erdê. Hem kezeba xwe bi cixarê reş dike û hem jî min gemarî dike. Lê ew nizane ku dema ez gemarî bibim, ji bo wî jî nebaş e. Mîkrob û nexweşî ji gemarên ku ew tavêjin, çêdibin. Dema ku ez ji gemar û mîkroban paqij bibim. Ew jî ji wan xelas dibe.

Dara sêvê bi gotinên kolanê gelekî xemgîn bû û got:

Ez bawer dikim, ew ê rojekê vê rastiyê bibînin.

## Pirs:

1) Çima kolan bi hêrs dibe?
2) Kul û derdê dara sêvê çi bû?
3) Encama avêtina gemarê ya li kolanan çi ye?
4) Bi baweriya darê, wê rojekê çi bibe?

## Peyvên dijhev, bigihîne hevûdu:

| | | |
|---|---|---|
| Gemar | | Lewaz |
| Ciwan | | Stûr |
| Qelew | | Ronî |
| Zirav | | Dereng |
| Tarî | | Fireh |
| Birçî | | Bin |
| Zû | | Têr |
| Teng | | Paqij |
| Ser | | Kal |

# OMER



Omer kurekî jîr e. Ew diçe dibistanê. Li dibistanê bala xwe dide waneyên xwe. Ew guhdarî mamosteyên xwe dike. Bi hevalên xwe re şer nake. Omer ji hevalên xwe hez dike. Hevalên wî jî ji wî hez dikin. Ew û hevalên xwe alîkariya hev dikin. Dema ku ji dibistanê tê malê, beriya her tiştî, waneya xwe ya malê çêdike. Piştre diçe derve û bi hevalên xwe re dilîze. Omer bi gokê dilîze. Ew lîstikvanekî jêhatî ye.

**Pirs**:

1) Omer kurekî çawa ye?
2) Omer li dibistanê bala xwe dide çi?
3) Omer bi çi dilîze?
4) Omer lîstikvanekî çawa ye?

**Valahiyên li jêr,  bi van peyvan dagire:**

**alîkariya  –  dilîze  -  hez –  fûtbolê  - malê**

Omer ji hevalên xwe ........... dike. Hevalên wî jî ji wî hez dikin. Ew û hevalên xwe .................... hev dikin. Dema ku ji dibistanê tê ................., beriya her tiştî, waneya xwe ya malê çêdike. Piştre diçe derve û bi hevalên xwe re ............. Omer bi .................. dilîze. Ew lîstikvanekî jêhatî ye.

**Peyvên li jêr, di nava hevokan de bi kar bîne:**

**Nêrgiz**,  **çivîk**,  **lehî**,  **bihar**

Ji lêkerên di nava kevanan de forma dema niha hilbijêre:


**Mînak:**

Ez (<u>diçim</u>  -  biçim) dibistanê.

Ew sêvê (bixwe  -  <u>dixwe</u>).

1) Ez bi gokê (dilîzim  -  dilîst).
2) Mustefa (xebitiye  -  dixebite).
3) Ew ji dibistanê (hat  -  tê).
4) Hûn pirsan (dixwînin  -  xwendin).
5) Em daran (dîtin  -  dibînin).

# BIRATIYA QULING Û ROVÎ



Rojekê ji rojan Roviyekî xwedî fen û fût di rêyekê de diçû. Qulingekî di nava zeviyekê de dibîne. Ber bi quling ve diçe û silav lê dike û dibêje:

Silav hevalê Quling!

Quling: Ser seran û ser çavan roviyê delal.

Rovî: Qulingê binê beriyê, ez dixwazim em bibin dest û birayên hev.

Quling: Ser çavan, lê divê em hev û din bixwazin ser xwarineke xweş.

Rovî: Çima na! Lê tu pêşî xwarinê çêke.

Quling: Na tu pêşî.

Rovî: Bila ez ê pêşî çêkim.

Rovî çû legenek hewdela rohn çêkir û anî, banî Quling kir; were birayê delal em bibin dest û birayên hev. Rovî çû ser latekê sekinî û ew legena hewdela rohn bi ser latê de kir û got; were birayê  Quling bixwe.

Quling hat û lê nerî; nikilê xwe lê da, kir û nekir tiştek ber neket, êş kete serê wî û got: Bese min têr xwar. Rovî dibêje, birayê Quling bixwe û rovî jî zimanê xwe li tehtê dide û talêse.

Quling got: Birayê rovî, vê carê ez ê te bixwazim ser xwarineke xweş.

Rovî got: Bila, Quling jî çû kundirekî qirik zirav anî, neh deh lib nok kirin binê kundir û got: Birayê Rovî were bixwe.

Rovî li dora kundir çû û hat; kir nekir nikarî nokan bixwe. Quling nikilê xwe bir binê kundir û nok xwarin, rovî got: Bese birayê quling min têr xwar.

Quling ji Rovî re got: Were ez ê te hînî firê bikim. Rovî rabû û li ser baskê quling siwar bû. Quling firî çû jor û dît ku Mele Silêman li ser kurkê xwe nimêj dike. Quling rabû û rovî berda xwar û got: Ne li erd û ne li ezman, li ser kurkê Mele Silêman. Melê nerî ku yek ji ezmên ve tê xwarê, hema rabû kurk hişt û bazda. Rovî jî li ser kurk ket, rabû kurk li xwe pêça û çû li ber kuna xwe rûnişt.

## Pirs:


1) Rovî çi ji Quling xwest?
2) Rovî çi xwarin ji Quling re çêkir?
3) Çima Quling nikarîbû hewdelê bixwe?
4) Quling çi xwarin ji Rovî re çêkir?
5) Dema ku Quling, Rovî ji ezmanan ve berda xwarê, ew li ku ket?

## Xaçepirsê, li gorî bersiva pirsên li jêr dagire:



| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 1 | D | | | | | | |
| | | 2 | | I | | | | | | |
| | 3 | | | Ş | | | | | | |
| 4 | | | | E | | | | | | |
| 5 | | | | W | | | | | | |
| | | 6 | | I | | | | | | |
| 7 | | | | T | | | | | | |
| 8 | | | | E | | | | | | |










1) Ahîn çi dike?
2) Çûk çi dike?
3) Delal çi dike?
4) Nesrîn çi dike?
5) Dema ku mirov birçî be, çi dike?
6) Ehmed çi dike?
7) Şivan çi dike?
8) Zozan çi dike?








# PERPERÎK

Perperîka evîndar

Xalên perên te jîndar

Li ser gulan digerî

Bi te dibim hêvîdar



Tu kes nebêjin kulî

Ew ê lingê wî stirî

Ev guleke difire

Xemla derdora min î

**Penaber**

**Pirs**:

1) Xalên perên perperîkê çawa ne?
2) Li ser çi digere?
3) Lingên kuliyê çawa ne?

**Ji peyvên li jêr, hevokan saz bike:**

1) (Amedê, zebeşên, in, belek)

   ............................................................

2) (sor e, Goka, Ehmed)

   ............................................................

3) (min, cotkar, xalê, e)

   ............................................................

4) (Ez, dibistanê, ji, dikim, pir, hez)

   ............................................................

# BEŞA ÇAREM



# KURKÊ ROVÎ



Rojekê Roviyek bi kurkê Mele Silêman li ber kuna xwe rûniştiye. Dem zivistan e, dunya sar e, xwe di nava kurk de germ kiriye û şêrek di wê sermayê de di ber rovî re derbas dibe:

Ha rovî, te ev kurk ji ku diziye.

Rovî lê vegerand:

Ho ho mamê şêr, ma tu nizanî ez kurkçêker im, bavê min, kalikê min hemû kurkçêker in. Ji berê de em ji malbata kurkçêkeran in. Ma tu nizanî?

Baş e! Tu dikarî kurkekî min jî çêkî?

Rovî got: Erê, ez dikarim. Gereke tu gelek tiştan bînî.

Şêr got: Weke çi?

Rovî got: Divê tu pênc berxên biçûk bînî, heger temam nebû jî, ez ê ji te bixwazim.

Şêr got: Temam, min pejirand. Rabû çû û roja din pênc berx ji rovî re anîn. Rovî her sê mehên zivistanê pê hol kir. Carekê şêr hat û got:

Ha rovî, kurkê min çawa bû?

Rovî got: Mamê şêr, weleh milik mane û wê çêbibe. Bi vî awayî, çend berxên din jî xwarin û heta zivistan derbas bû, şêr vegeriya cem rovî û bihêrs pê re axifî.

Rovî jî xwe kir kunê. Lê şêr ew ji kunê derxist û banê wî avrêj kir, têra wî lêdan kir û ew ji herêmê qewitand. Ji wê rojê ve, ji tişta dereng dimîne re dibêjin:

"**Ew bû kurkê rovî**".

## Pirs:

1) Rovî, xwe bi çi germ kiriye?
2) Şêr, çi ji rovî dixwazî?
3) Rovî, çi ji şêr xwest?
4) Çima şêr, têra rovî lêdan kir?

**Hevokên li jêr bixwîne:**

Min dixwest bi te re bipeyivim, **lê** ez pê re negiham.

Husên **û** Elî bi hev re çûn dibistanê.

Sibe ezmûna min e, **lewra** ez niha dixwînim.

Bexçeyê **ku** xuya dike, ew ê me ye.

Ez dereng mam, **ji ber ku** karê min hebû.

> Peyvên (**ku**, **û**, **lê**, **ji ber ku**, **lewra**...) gihanek in.
>
> **Gihanek,** bi serê xwe bêwate ne. Peyvan, yan jî hevokan bi hev ve girê didin.

**Valahiyan, bi gihanekên li jêr, dagire:**

**lewra, û, ji ber ku, lê, ku**

a) Em bi lez çûn, ........ dîsa em negihîştin hevalên xwe.
b) Xwendekarê .......... bi serket birayê min bû.
c) Cemîl ...... hevalê xwe çûn bazarê.
d) Xelat nehat karê xwe, .................. nexweş bû.
e) Baran dibare, ............... ez sîwana xwe hildigirim.

# XATÛN



Xatûn, keçeke jîr û jêhatî ye. Her sibeh zû ji xew radibe, dest û çavên xwe dişo û taştê dixwe, piştre diranên xwe baş dişo û pora xwe şeh dike. Paşê çentê xwe digire û diçe dibistanê.

Li dibistanê, mamosteyên xwe baş guhdar dike û waneyên xwe baştir fêr dibe. Pirtûk û lênûsên xwe jî paqij dihêle, ji dibistanê pir hez dike, lewra jî hemû mamosteyên wê jê xweş in.

Dema vedigere malê, destpêkê karê malê diqedîne û piştre diçe bi hevalên xwe re dilîze.

## Pirs:

1) Xatûn keçeke çawa ye?
2) Pirtûk û lênûsên wê, çawa ne?
3) Xatûn dema vedigere malê, destpêkê çi dike?

## Cihên vala, bi peyvên li jêr dagire:

**baştir** , **xweş** , **paqij** , **guhdar** , **dibistanê**

Li dibistanê, mamosteyên xwe baş .............. dike û waneyên xwe................ fêr dibe. Pirtûk û lênûsên xwe jî .............. dihêle, ji .................... pir hez dike, lewra jî hemû mamosteyên wê jê .................. in.

# SÎSIKA HILÛKÊ



Dayikê ji zarokên xwe re hilûk kirîbûn. Wê hilûk xistin taseke mezin û danîn li ser mêzeyê ku piştî şîvê, wan li zarokên xwe parve bike. Lawê wê Meksîm, heta wê rojê qet hilûk nexwaribûn. Lewma hilûkan bala wî pir dikişandin. Ew li derdora hilûkan diçû û dihat, dida ber lotikan. Li wan dinerî û bêhn dikirin. Hilûkan av bi devî wî dixist. Wî hew dît ku li odeyê bi tenê maye. Ma êdî kes dikare wî bigire! Hema rahişt hilûkê û bi carekê de avêt devê xwe.

Dayikê beriya şîvê, hilûk hejmartin. Yek kêm bû. Ew çû, ji hevjînê xwe re got.

Bav, zarokên xwe li dora mêzeyê civandin û ji wan pirsî:

- Delaliyên min! Hilûkek kêm e, ma kê xwariye?

Hemûyan bi hev re got:

- Na, me nexwariye.

Lê, rûyê Meksîm sor bû:

- Na, min tiştek nexwariye.

Piştî van gotinan, bavê zarokan axaftina xwe wiha domand:

- Kesê ku ew hilûk xwariye, helbet tiştekî nebaş kiriye. Lê kesê ku sîsika hilûkê bixwe, di nava rojekê de dimire. Tişta herî xerab ev e. Tirsa min, ji vê yekê ye.

Rûyê Meksîm zer bû û qêrînî pê ket:

- Na min sîsik nexwariye, min sîsik di pacê re avêt derve! Hemû bi hev re kenîn, lê Meksîm dest bi girî kir.

Leo Tolstoy

## Pirs:

1) Dayikê hilûk xistin çi?
2) Navê lawik çi bû?
3) Lawik li dora hilûkan çi dikir?
4) Ma mirov bi xwarina sîsika hilûkê dimire?

**Bersiva rast hêma bike:**

1) Dayika zarokan dixwest çi li hilûkan bike?
   a) bavêje b) bixwe c) li zarokan parve bike
2) Çima hilûkan, bala Meksîm dikişand? Ji ber ku:
   a) heta wê rojê nexwaribûn b) tirş bûn c) reş bûn
3) Dema Meksîm li odeyê bi tenê ma, çi kir?
   a) raza b) hilûk avêt devê xwe c) şekir xwar
4) Dema dayikê dît ku hilûkek kêm e, ji kê re got?
   a) mamoste b) cîranan c) hevjînê xwe
5) Çima rûyê Meksîm sor bû?
   a) nexweş bû b) derew kiribû c) betilî bû
6) Çima rûyê Meksîm zer bû?
   a) tirsiya bû b) zerikî bû c) fedî kiribû

**Bêjeyên li jêr ên ku binê wan xêzkirî ne, bike pirjimar:**

1) Delaliyê min. ..................................................
2) Delaliya min. ..................................................
3) Rahişt sîsikê. ..................................................
4) Zerika mezin. ..................................................
5) Mêvanê me hat. ..................................................

# RÊYA PEYAYAN



Li bajaran, li ser riyên tirimbêlan, riyên peyayan jî hene. Dema ku mirov ji aliyekî derbasî aliyekî din dibe, divê mirov li ser van rêyan bimeşe. Ew bi xêzikên spî û stûr tên nîşankirin. Hebûna wan rêyan, çûn û hatina tirimbêlan û peyan hêsan dike. Li ser hinek rêyan jî lempeyên trafîkê hene. Hinek ji van lempeyan ji bo tirimbêlan in. Ew kesk, zer û sor in.



Dema lempeya sor pêdikeve, tirimbêl disekinin. Dema lempeya zer pêdikeve, ajokar xwe amade dikin. Dema lempeya kesk jî pêdikeve, ajokar tirimbêla xwe diajon û diçin. Hinek lempe jî ji bo peyayan in. Li ser van lempeyan wêneyên sê mirovan hene. Yek sor e, ji bo ku em rawestin.Ya zer, ji bo ku em xwe amade bikin. Ya din jî kesk e, ji bo ku em derbasî aliyê din bibin.

Di van rêyan de divê mirov gelekî hay ji xwe hebe. Ajokarên tirimbêlan jî carinan şaş dibin. Li ser van rêyan gelek bûyer çêdibin.



Li ser rêyên peyayan ên bê lempe, divê mirov bêhtir hay ji xwe hebe. Beriya ku mirov derbas bibe; divê pêşî li ser milê çepê binêre, paşê li ser milê rastê û pîştre careke din li ser milê çepê binêre. Eger ti tirimbêl li ser rê nebin, wê demê mirov dikare derbasî aliyê din bibe.

## Pirs:

1) Lempeyên tirafîkê bi çi rengî ne?
2) Riyên peyayan bi çi rengî ne?
3) Ji bo çi riyên peyayan çêkirine?
4) Beriya ku tu rê derbas bikî, divê tu çi bikî?

**Valahiyên li jêr, bi van peyvan dagire:**

**rastê**, **lempe**, **çepê**, **derbas**, **tirimbêl**, **aliyê**

Li ser riyên peyayan ên bê ................, divê mirov bêhtir hay ji xwe hebe. Beriya ku mirov ................ bibe, divê pêşî li ser milê ............... binêre, paşê li ser milê ................ û piştre careke din li ser milê çepê binêre. Eger ti ................ li ser rê nebin, wê demê mirov dikare derbasî ............. din bibe.

## Peyv û rengên li gorî wan, bigihîne hev:

| | | |
|---|---|---|
| Giya | | Zer |
| Berf | | Reş |
| Ezman | | Sor |
| Rok | | Spî |
| Şev | | Şîn |
| Xwîn | | Kesk |

## Peyva rast, li cihê vala binivîse:

(Çar/Car) ............. birayên min hene.

(sîr/şîr) Me li gund ........... diçand.

(şûr/şor) Xwarinên dayika min, carinan ............. in.

(ker/kêr) Em di zaroktiya xwe de li .........an siwar dibûn.

(çav/cav) ............ên Ehmed şîn in.

(tûr/tor) ............ê me tije şekir e.

Li cihên vala, (xw) binivîse û bi deng bixwîne:



Ez kîvroşk im, kunberoşk im, ....eş hevroşk im.



Ez şêr im, xortekî .....eşmêr im.



Ez rovî me, siwarekî çelebî me, goştê min nayê .....arin.



Ew tirî ye, weşî reş, pê rehet dibe ne.....eş.



Ez mirîşk im, nan hevrîşk im, goştê min tê .....arin.



Ez hirç im, tev de pirç im, goştê min nayê .....arin

# SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ



Li newaleke kûr bûm
Dareke pir dirêj bûm
Ser û binê xwe ter bûm
Bi çiq û belgên kesk bûm

Rojekê hat min birek
Li xakê kirim dîrek
Winda kir ev şox şeng
Min xirkandin bi kotek

Ketim mekînê bi lez
Ez hûr kirim gez bi gez
Hin şol çêbûn lez bi lez
Min dît ez bûme kaxez

Niha jî pirtûkek xweş
Zarok bi min dil bi geş
Min dixwînin çavên reş
Ji kêfa bûm gula geş

**Dengê Penaber**

## Pirs:

1) Dara li newalê çawa bû?
2) Mekîne çi ji darê kir?
3) Zarok çi ji pirtûkê dike?

## Navên li jêr, di cihên vala de binivîse:

**bilûr**, **xanî**, **pênûs**, **sêv**, **sol**

1) Rûken bi ..................... dinivîse.
2) Şivan li ....................... dixe.
3) Bavê min ji min re cotek ................ kirî.
4) ...................... mezin e.
5) Min sê kîlo ..................... kirîn.

# SERSALA WE PÎROZ BE



Em şeva sersalê, li mala me civiyan. Malbatên xal û apê min jî mêvanên me bûn. Me xwarinên xweş çêkirin. Me bi hev re xwarin xwar. Me li televizyonê temaşe kir. Em bi hev re lîstin. Em di demjimêr dozdehan de derketin derve. Cîranên me jî hemû li derve bûn. Ew jî tevlî me bûn. Ezman bi şewqa fîşekên hewayî rengîn bû. Weke keskesorê vedidan. Me sersala hevûdu pîroz kir û sersala we jî pîroz be.

## Pirs:

1) Kî li mala wan bûn?
2) Wan li çi temaşe kir?
3) Ew kengî derketin derve?
4) Wan li derve çi kir?

### Valahiyên li jêr, bi van peyvan dagire:

**pîroz – fîşekên hewayî – temaşe – derve – dozdehan**

Me li televizyonê .................... kir. Em bi hev re lîstin. Em di demjimêr .................. de derketin derve. Cîranên me jî hemû li ............... bûn. Ew jî tevlî me bûn. Ezman bi şewqa ............... ............ rengîn bû. Weke keskesorê vedidan. Me sersala hevûdu............... kir û sersala we jî pîroz be.

# Peyvên hevdeng:

**Mînak:**

Kêr - şêr

Şîr - sîr

Ta - ba

Pisîk - çivîk

**Peyvên hevdeng ên li jêr, bigihîne hev:**

| | | |
|---|---|---|
| Girî | | Mar |
| Xanî | | Gulistan |
| Dar | | Beq |
| Req | | Kund |
| Zêr | | Kanî |
| Gund | | Tirî |
| Dibistan | | Bêr |

## KÛÇIK Û PARÇEGOŞT



Rojekê kûçikekî birçî di ber malekê re derbas dibe. Dibîne ku pîrê goşt hûr dike. Dema ku çavên wî bi goşt dikeve, gilîz ji devê wî diherike. Ew hêdîka ber bi pîrê ve diçe. Xwe nêzîkî goşt dike. Li ser lingên xwe yên dawiyê rûdine û lêvên xwe dialêse. Bi vî awayî, keysa xwe tîne, ku ji xwe re parçegoştekî birevîne.

Parçeyek goşt ji destê pîrê dikeve erdê. Ma êdî kî dikare kûçik bigire! Diranên xwe qîç dike û xwe ji nişkê ve diavêje goşt û ber bi mala xwe ve direve.

Di riya wî de çemek heye û li ser çem jî pirek heye. Divê kûçik di ser vê pirê re derbas bibe.

Kûçik, parçegoşt di devê wî de, digihîje ser pirê. Li ser pirê çawa ku li avê dinere, dibîne ku kûçikekî din û di devê wî de parçegoştek xuya dike.

Kûçik dixwaze ku wî parçegoştî ji kûçikê din bistîne. Bi vê çavbirçîbûnê, devê xwe vedike û êrîşî kûçikê din dike. Wê demê, goştê di devê wî de dikeve nava avê û pê re diçe.

Kûçikê me, bi vê çavbirçîbûn û bêhişiyê, ji goştê devê xwe jî bêpar dimîne. Dûvê xwe dixe nav lingên xwe û matmayî li ava ku diherike, dinere. Ew tênegihişt ku kûçikê di nava avê de xuya dike, ew bi xwe bû.

## Pirs:

1) Dema kûçikê birçî di ber malê re derbas dibe, çi dibîne?
2) Çawa kûçik êrîşî goşt kir?
3) Di riya kûçik de çi hebû?
4) Kûçik di nava avê de çi dît?
5) Goştê di devê kûçik de bi ku ve çû?
6) Naveroka çîrokê, li ser çi bû?

## Valahiyan, bi peyvên li jêr dagire:

**bistîne – dinere – êrîşî – parçegoşt – avê – xuya dike**

Kûçik, ......................... di devê wî de, digihîje ser pirê. Li ser pirê çawa ku li avê ............., dibîne ku kûçikekî din û di devê wî de parçegoştek ......... ......... .

Kûçik dixwaze ku wî parçegoştî ji kûçikê din .............. Bi vê çavbiçîbûnê devê xwe vedike û ............... kûçikê din dike. Wê demê, goştê di devê wî de dikeve nava ......... û pê re diçe.

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Hefte / Meh | Hefteya Yekem | Hefteya Duyem | Hefteya Sêyem | Hefteya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Malbata Selme | Em Dihejmêrin |
| Cotmeh | Dawet | Ev Çi Ye? | Rovî û Qijik | Payîz |
| Mijdar | Berx û Karik | Şivan | Nameya Zelalê | Nan |
| Berfanbar | Li Bazarê | Demsal | Dîk û Kîso | Birayê Min Nexweş e |
| Rêbendan | Nanpêj | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | Nîvê Biçûk | Pisîk û Mişk | Kolan û Paqijî | Omer |
| Avdar | Biratiya Quling û Rovî | Perperîk | Kurkê Rovî | Xatûn |
| Cotan | Sîsika Hilûkê | Rêya Peyayan | Serpêhatiya Pirtûkê | Sersala We Pîroz Be |
| Gulan | Kûçik û Parçegoşt | NIRXANDIN | | |